

Nirxandinek li Ser Berhema Rewşa Kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkîyeyê

A Review on Book *The Sociolinguistic Situation of Kurdish in Turkey*

Şükran COŞKUN*

COŞKUN, Şükran, (2022),
"Nirxandinek li Ser
Berhema bi Navê Rewşa
Kurdî ya Sosyolenguîstîk
li Tirkîyeyê", Nûbihar
Akademî, no. 18, p.299-
310, DOI: 10.55253/2022.
nubihar.111637.

Genre/Cure: Book Review/
Nirxandina Pirtûkan

Received/ Hatîn:
08/12/2022

Accepted/ Pejirandin:
24/12/2022

Published/ Weşandin:
31/12/2022

ORCID:
0000-0001-9898-0104

Plagiarism/Întihal:
This article has been
reviewed by at least two
referees and scanned via
ithenticate plagiarism
website./ Ev gotar herî kêm
ji aliyê 2 hakeman ve hatiye
nirxandin û di malpera
întihalê ithenticate re hatiye
derbaskirin.

1. DESTPÊK

Sosyolenguîstîk, li ser têkilîya ziman û civakê di-
sekine, ew destnîşan dike ka ziman di nav civakê da
çawa tê bikaranîn. Ji salên 1960an û bi şûn da teswîra
sosyolenguîstîkê ya zimanên kêmar (minority) bûye
qada lêkolînên teorîk û sepandî (applied). Ev qad,
paşxaneyê xwe jî xebatên duzimanîyê digire. Di he-
man demê da xebatên sosyolenguîstîk ên zimanên
kêmar li ser zaravayan jî disekine. Di vî warî da li ser
ziman û civakên bindest, li ser koçberî û dîasproyê xe-
bat hatine kirin. Öpengin, di vê xebata xwe da rewşa
kurdan a li Tirkîyeyê, ji aliyê sosyolenguîstîkê ve veko-
laye û faktorên ku li ser bikaranîna ziman tesîr kirine
ji perspektîfên cuda ve analîz kirîye û li ser lîteraturê
zêde kirîye. Pirtûk jî destpêk û pênc beşan pêk tê. Li
pey encamê di pêvekê da pirsîyarname û tabloyên
lêkdana daneyan cih girtine. Di dawîyê da ferhengoka
têgehhan lê hatiye zêdekirin.

Nirxandina pirtûkan di lîteratura akademîk da
cihekî giring digire. Armanca vê xebatê ne tenê
tespîtkitina aliyên serkeftî yan jî qisûr û kêmasîyên
pirtûkê ne. Di heman demê da beşên pirtûkê hatin

* Xwendekara Doktorayê, Zanîngeha Mêrdîn Artûklûyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Beşa Ziman
û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Tirkîye./Doctoral Student, Mardin Artuklu University, Living Languages Institute,
Kurdish Language and Culture Department, Mardin, Turkey. e-mail:sukran_coskun_@hotmail.com

teswîrkirin da ku xwîner di derheqê teori, rêbaz, şekil û naveroka pirtûkê da agahîder bin. Di vê xebatê da li ser pirtûkê nixandineke bi giştî hatiye kirin, wesfên erênî û neyînî yên pirtûkê hatine diyarkirin û analîzkirin.

Berhem ji aliyê zimannas, akademisyen û wergêr Ergin Öpengin ve hatiye amadekirin û di sala 2011an da ji weşanên Avestayê derketiye. Öpengin, di sala 2009an da mastera xwe li ser zimannasîya civakî li Fransayê li Zanîngeha Rouenê kirîye ku ev berhem, wergera teza wê mastera wî ye. Li gorî agahiyên ku ew bi xwe dide beşên xebatê nehatine guhertin, lê di beşa duyem da nêzî şeş rûpelên bi sernavê “*Guherîna Zimanî*” jê hatiye derxistin ku ew yek nîqaşeke teorîk û teknîkî bûye. Her wiha ji bo têgihîştinê hinek têbinî jî lê hatine zêdekirin. Ji bo termên nû yên qadê, li bal kurdî îngilîzî yan jî frensîya wan di nav kevanekê da bi awayekî îtalîk hatine dayîn. Dîsa termên soranî bi îtalîk hatine nivîsîn. Di hin cihan da jî term bi zimanê resen hatine bikaranîn, lê deng û morfolojîya kurdî girtine. Ji bilî vê, li dawîya pirtûkê jî ji bo terman ferhengokek hatiye amadekirin. Ergin Öpengin di serî da bi sernavê “*Çend gotin li ser wergera kurdî ya vê berhemê û spasdarî*” cih daye van agahîyan. Digel vê xalê, di vê sernavê da li ser bikaranîna bazinedaçek û rengdêrçêkerê sekinîye û nivîsîna navên ziman, welat û neteweyan jî diyar kirîye. Bi van agahîyan ji aliyê fahmkirinê ve metna lêkolînê hêsan kirîye. Dîsa ji aliyê rastnivîsê ve bi awayekî gelemperî metn hevgirtî be jî xeletiyên biçûk li ber çavan dikevin. Bo mînak; sedsal bi gelemperî bi reqemên romen hatine dayîn (sedeya VIIIan/r.77), lê bikaranîna hejmaran bi latînî jî hatiye nivîsîn (sedesala 15an/r.69). Di hevokên “...ev **qurs berdewam nebûn** (r.102), ...**dema ku kûrs hatine girtin** (r.105)” da wekî ku tê dîtin bikaranîna peyva kursê ne hevgirtî ye.

Destpêka pirtûkê bi bûyera mebûstîya Leyla Zana ya 1991ê dest pê dibe ku Leyla Zana di parlamentoya Tirkîyeyê da di sonda mebûstîyê da hevokeke kurdî gotibû û ji ber vê yekê bertekên mezin pêk hatibûn. Bi vê bûyerê bala kurdan hatiye kişandin ku zimanê wan ne xwedîyê statuyeye bilind e û di qadên giştî da hatiye astengkirin. Öpengin diyar kirîye ku ji ber kêmasîya xebatên sosyolinguîstîk ên li ser kurdî bere xwe daye xebateke bi vî rengî û lêkolîna xwe li ser “*di axaftina rojane da tercîh û bikaranîna ziman*” ava kirîye. Pirtûk ji aliyê xebatên sosyolinguîstîk ve valahîyeke mezin dagirtîye û ji xebatên nû ra rêya lêkolînê vekirîye. Navê pirtûkê û naveroka wê ji aliyê agahiyên teorîk ve hevgirtî be jî xebat ji aliyê lêkolîna qadê ve hejmaran kurdan a li Tirkîyeyê bi giştî temsîl nake. Jixwe di pirtûkê da ev yek tevî sedemên wê hatiye ravekirin. Bi agahiyên di cih da xwîner di derheqê lêkolînê da hatine haydarkirin, xebat di nav hûrgilîyan da nehatiye xeniqandin, lê cih bi cih dubare hatine kirin. Ji ber ku ev dubare ji bo ragihandinê ne, ahenga metnê xera nekirine. Xebat li ser esasê pirsîyarnamê û sê kontekstên cuda yên herêmên kurdan ên

li Tirkîyeyê hatîye meşandin. Piştê bersivên pirsîyarnameyê hatine teswîrkirin û sinifandin. Ev xebat ji pênc beşan pêk tê. Nivîskar di beşa yekem da problematîk û hîpotezan diyar dike ku ji bo paşxaneyê lêkolînê kurte-destpêkek hatîye dayîn. Ji xeynî beşa duyem di serê her beşê da kurte-destpêkek hatîye amadekirin. Di beşa duyem, sêyem û pêncem da bi “venihêrîn” eke dawîya beşê, nixandina beşê hatîye kirin. Di beşa duyem da di çarçoveya giştî ya konteksta ziman da têgehên bingehîn ên teswîra sosyolenguîstîkê hatîne ravekirin. Di beşa sêyem da li ser rewşa kurdan a li Tirkîyeyê hatîye sekinandin û di nav şert û mercên sîyasî-civakî da diyardeyên bi kurdî ra eleqedar hatine şîrovekirin. Di beşa çaran da metodolojîya xebata qadê hatîye dayîn. Di vê beşê da amûrê berhevkerina daneyan û metoda tehlîla daneyan bi hûrgilî hatîye nixandîn. Di beşa pêncem a dawîyê da ji bo têgihîştina rewşa kurdan a li Tirkîyeyê, encamên lêkolînê hatine nîşandan û bi grafîkên frekansê bikaranîna ziman a qadên lêkolînê hatîye tespîtîkirin. Bi saya van grafîkan daneyên lêkolînê hatine şênberkirin. Piştê encamên lêkolînê hatine dayîn û di pêvekê da pirsîyarname (tirkî/kurdî) tevî bersivên beşdaran ên konteksta gund, nîv-bajarî û bajarî hatine bicihkirin. Tabloyên lêkdana daneyan jî di pêvekê da cihên xwe girtine. Di dawîyê da ferhengoka têgehên lê hatîye zêdekirin. Li dawîya xebatê lîsteya çavkanîyan hatîye dayîn ku ji bo vê xebatê ji 146 çavkanîyan sûd hatîye wergirtin. Öpengin, di bergê dawî yê pirtûkê da bi dubarekirina armanc, pirs û hîpotezên lêkolînê, problematîka mijarê derxistîye pêşberî xwîneran û bi vî rengî bala xwîneran kişandîye ser mijarê.

2. PIRSYAR Û HÎPOTEZÊN LÊKOLÎNÊ

Zanista Sosyolenguîstîk, di sedsala XXem da dest pê kirîye. Berîya vê serdemê hinek nivîskar, bikaranîna ziman çawa li ser faktorên civakî yên sinif, pisporî, temen, zayend û hwd. tesîr dike yan jî çawa di bin tesîra van hêmanan da dimîne vekolane. Ferdinand de Saussureyî (1875-1913) ku wekî bavê zanista modern tê dîtîn, ziman wekî cureyekê helwesta civakî diîyê û ji vî alîyî ve li ser civaknasên frensî yên serdema xwe tesîr kirîye (Hickey, 2007, r. 2). Zimanê kurdî kêman caran bûye mijara lêkolîneke teswîra sosyolenguîstîkê. Hin xebat li ser rewşa sîyasî-civakî û li ser kurdên dîasporayê hatine kirin. Lê ev xebat bi tevahî rewşa kurdan diyar nakin. Ji ber vê yekê Öpengin, xwestîye ku rehendê sosyopolîtîk ên rewşa kurdên li Tirkîyeyê teswîr bike û frazên ziman ên axêverên kurd tehlîl bike. Bi gelemperî armanc, hîpotez, sînor, metodolojî û hwd. di destpêkê da bê dayîn jî di vê xebatê da wekî beşa yekem piştî kurte-destpêkekê di heft sernavan da rê û rêbazên lêkolînê hatine ravekirin (bnr. Öpengin, 2011, r. 23-29). Di lêkolînê da rê û rêbazên hatine diyarkirin heta dawîya lêkolînê bi awayekî

serkeffî hatine sepandin. Armanca xebatê ev e ku têgihîştina zanistî ya dînamîkên sosyolenguîstîk ên kurdî li Tirkîyeyê hêsan bike. Dîsa bi vê xebatê hatîye xwestin ku teorîyên ji hev cuda bînin ceribandî û nirxandin. Xebat li ser teorîyên Edward (ç.1992) û Fishman (ç.1965, 1967, 1968) ava bûye. Bi teorîya Edward, rewşa kurdî ya Tirkîyeyê ji alîyê faktorên zimanî, siyasî civakî û hwd. hatîye tehlîl kirin. Ji bo pêşkêşkirina krîterên pirsîyarnamê û ji bo tehlîl kirina daneyên vekolînê ji teorîya Fishman sûd hatîye wergirtin. Öpengin, di bin sernavê “*Pirs û hîpotezên lêkolînê*” da ji bo analîz kirina xebatê çar pirsên sereke diyar kirine:

“1. *Îro, kîjan faktorên zimanî û der-zimanî xwedantesîr in li ser werara rewşa zimanê kurdî li Tirkîyeyê?*

2. *Gelo sazkarî û pêşhatên van heyamên dawî di warê siyasî û pratîk de li Tirkîyeyê xwedantesîr in li ser **sehên** (perception) welatîyên kurd sebarek bi zimanê xwe?*

3. *Kîjan faktor diyarker û biryarder in di tercîh û bikaranîna kurdîyê de li gor qadên civakî û rewşên danûstandina zimanî?*

4. *Rewşa faktayî/objektîf ya kurdîyê hevterîb e, an jî heta çî dereceyê hevterîb e, digel tercîh û bikaranîna zimanî ya di jiyana rojane de?”* (Öpengin, 2011, r. 27-29)

Bi van pirsan li ser tesîra faktorên sosyo-polîtîk ên rewşa kurdan hatîye sekinandin û ev yek li ser bikaranîna ziman nîqaşek derxistîye holê ku ji vê yekê gihiştîye rehendên nû. Bi frazên ziman ên axêverên kurd ên li Tirkîyeyê, ev rehend hatine nîşandan. Ji ber ku di jiyana rojane da tercîh û bikaranîna zimanê kurdî têkildarî nîfş û kontekstên sosyalîzasyonê ne, varyabl ji komên bajarî, nîv-bajarî û gundewarî hatine hilbijartin.

3. ÇARÇOVEYA TEORÎK

Li Tirkîyeyê zimanên wekî aramî, arnawûdî, çerkezî, erebî, ermenî, gürçî, kurdî, lazî, pomakî, tirkî û hwd. tînin axaftin. Li herêmên kurdan dîyalektên kurdî yê zaza û kurmançî, tirkîya standart û ya herêmî, aramî û erebî tînin bikaranîn. Lê her çiqas hejmara zimanan zêde be jî tîkilîya kontaktê bi taybetî di navbera kurdî û tirkî da tîtin (Öpengin, 2011, r. 32). Öpengin li vir li ser sedemên tîkilîya navbera kurdî-tirkî nesekinîye, ji ber ku hejmara kurdan zêde ye tîkilîya kurdî-tirkî jî li gorî kêmarên din zêde ye. Peywendîyeke nisbî jî li çend bajarên kurdan di navbera kurdî û erebî da heye. Dîsa li Mêrdînê di navbera kurdî, aramî û erebî da peywendîyek tîtin (Öpengin, 2011, r. 32). Ev yek diyar dike ku bi peywendîya zimanan ra duzimanî xwe rê dide. Li gorî Baker, kesekî duzimanî di nav civakeke yekzimanî da nikare bi du zimanan biaxive. Lê di nav civakeke duzimanî da her du zimanan jî di jiyana xwe ya rojane da bi kar

tîne. Carinan kesên duzimanî zimanê xwe yê zikmakî li pêşîya zimanê duyem digirin. Carinan jî zimanê serdest dikeve pêşîya zimanê yekem (Baker, 1993, r. 13). Di çarçoveya kontakta ziman da têgehên wekî kontakta ziman, cemaeta ziman, duzimanî û diglosî, têkilî (interference) û guherîna ziman (language change) hatine tehlîlkin. Di vê beşê da cihê kurdî yê li Tirkîyeyê hatîye diyarkirin. Ev beş ji heft sernavan pêk tê ku tevî binsernavan ev yek digihê sih sernavî (Öpengin, 2011, r. 31-66).

Piştî pênaseya duzimanîtiyê Öpengin, dema ku behsa rehendên kognîtîf ên duzimanîtiyê dike balê dikşîne ser têkilîya serkeftina akademîk û duzimanîtiyê ku di herêmên kurdan da serkeftina akademîk kême: “...Herwiha, rastiya ku dereceyên herî nizm ên serkeftina akademîk li herêmê tene dîtin, hevterîb e digel îdîayên Cummins yê derheqê pêwendîya pola duzimanîtiyê û serkeftina akademîk de” (Öpengin, 2011, r. 36). Digel vê, wî rewşa dîglosiyê di kontakta kurdî û tirkî ya li Tirkîyeyê wekî dubendîya zimanî nixandîye ku hejmara kurdên tenê bi tirkî diaxivin her ku diçe zêdetir dibe. Ji bilî vê ji bo parastina ziman li ser bikaranîna ziman sekinîye ku zindîbûna ziman bi axaftina nifşên wî yê cuda ra têkildar e. Piştî guhertina ziman¹ (language shift) ku di sê nifşan da pêk tê, heke tu axêverên din ên zimanê ku hatîye berdan nemabin mirina ziman derdikeve holê. Digel vê yekê termên betilîn (language attrition) û windabûna ziman (language loss) jî têkildarî guhertina/zelîna ziman e. Bikaranîna ziman çiqas kême bibe xerabûn û lewazbûn jî di ziman da ewqas zêde dibe. Ev yek sebebê sereke yê betilîn û guherîna ziman e (Öpengin, 2011, r. 40-45). Bi sernava “*Modelên teswîra sosyolenguîstîk a rewşa zimanan*” li ser teorîyên ziman hatîye sekinandin. Bi van teorîyan ji bo lêkolîna qadên civakî paşxaneyek hatîye amadekirin. Di vê çarçoveyê da hatîye destnîşankirin ku kurdî digel zimanên herêmên bi sedan salan e di nav têkilîyeke kontakte da bûye û ji ber ku ne xwedîyê statuyeye fermî ye payeya zimanê nizm girtîye û ev yek bûye sedemê qelsbûna ziman. Öpengin gihiştîye vê encamê ku divê ji bo tehlîleke di vî warî da hejmareke mezin a varyablan hebe û tehlîl birreke faktorên din jî di xwe da bihewîne (Öpengin, 2011, r. 65).

4. REHENDÊN CIVAKÎ-SÎYASÎ YÊN REWŞA KURDÎYÊ LI TIRKÎYÊYÊ

Ji bo têgihîştina têkilîya di navbera rehendên sosyolojîk ji alîyê frazên ziman ên kurdên li Tirkîyeyê pêdivî bi ravekirina faktorên sosyo-polîtîk hene. Ev faktor rehendên bingehîn ên rewşa sosyolenguîstîkê ne (Öpengin, 2011, r. 67). Di çarço-

1 Ergin Öpengin wekî zelîna ziman bi nav kirîye. Zelîna ziman: “Qonaxek e di muam - leya cemaetê ya digel zimanê xwe de, ku di wê qonaxê de, endamên cemaetê qismen an jî bi temamî dev ji zimanê resen berdane û raxbetê li zimanekî din dikin. İng.lan - guage shift; fr.substitution de la langue (r.216).”

veya modela Edwards (ç.1992) da ji alîyê civakî-sîyasî ve rewşa kurdan a kêmarî ya li Tirkîyeyê piştî kurte-destpêkê bi diwazdeh sernavan hatîye nirxandin. Tevî bin- sernavan sih û sê sernav û du nexşe di vê beşê da cih girtine (Öpengin, 2011, r. 67-114). Di bin van sernavan da rewşa kurdên li Tirkîyeyê ji alîyê demografî, civaknasî, zimannasî, derûnnasî, dîrokî, erdnîgarî, perwerdeyî, aborî, dînî, sîyaset û medyayê ve hatîye destnîşankirin.

Welatê kurdan parçekirî ye, bi halê heyî kurd; di dewletên Îran, Iraq, Tirkîye, Sûriye û Ermenîstanê da dijîn. Nifûsa wan ji 30 milyonan zêdetir e û berfirehîya welatê kurdan 550.000 km kare ye. (Öpengin, 2011, r. 67-68). Öpengin digel van agahîyan bi nexşeya deverên piranî kurdnişîn jî welatê kurdan diyar kirîye. Di sed-sala Xem da çend xanedanîyên kurd ên wekî Şeddadî, Hesenweyhî, Merwanî derketine holê. Agahîyên di derheqê mîrektîyên kurdan wiha hatine îfadekirin: “*Piştî çar sedsalan hakimiyeta Tirkên Selçûqî û Moxolan, Kurd di sedsala 15an de, digel mîrîtiyên kurd, gihîştine serxwebûn an jî nîv-serxwebûna xwe li jêr desthilata raser a Împeratoriya Osmanî. Rûdawa herî girîng di vê pêvajoya nû de hevpeymaniya mîrîtiyên Kurdan û Osmaniyan bû li dijî Îranê*” (Öpengin, 2011, r. 69). Ev agahî ji Hassanpour û Bozarslan hatine girtin lê agahî baş nehatine ravekirin. Mîrektîyên kurdan ên li herêmê ji ber zext û zora Sefewîyan di sedsala XVIem da piştî Şerê Çaldiranê bi Dewleta Osmanîyan ra peymanek îmze kirîye (Adak, 2014, r. 196). Öpengin paşê diyar kirîye ku ji sedsala XVem heta nîvê sedsala XIXem mîrektîyên kurd desthilatdarîya xwe domandine. Bi van agahîyan wî xwestîye destnîşan bike ku kurd berê xwedîyê hêz û desthilatdarîyê bûne. Lê wekî ku me li jor jî got peyman her çiqas mîrektîyên kurdan di dawîya sedsala XVem hêza wan zêde bûbe jî di serê sedsala XVIem da peyman hatîye îmzekirin û piştî vê serdemê mîrektîyên kurd di bin sîya Osmanî da bûne xwedîyê erk û otonomîyê.

Di sernava “*Rewşa kurdan a îro*” da kurdên Iraq, Tirkîye, Îran, Sûriye û Ermenîstanê bi awayekî berawirdî hatîye ravekirin. Ji ber ku ji xeynî kurdên Iraqê, kurd li tu dewletên din bi fermî nehatine naskirin û rêvebirîyeke wan a sîyasî ava nebûye, Öpengin bal kişandîye ser rewşa kurdan a sîyasî û rewşa kurdên Iraqê ji bo kurdên Tirkîyeyê wekî mînak nîşan daye: “*Kurdî yek ji zimanê resmî ye li Iraqê, herwiha zimanê resmî û zimanê perwerdeyê ye li herêma Kurdistanê. Bi xêra wê hindê kurdî li wî welatî hergav hatiye naskirin û ku ji cerga naskirina otonomîya herêmê ziman di hemû dezgehên dewletî û jiyana civakî de tê pêşxistin, rewşa zimanî nisbeten baş e. Îro digel asayîbûna nisbi ya rewşa siyasî li herêmê, danûstandineke zêde heye di navbera Kurdên Iraq û yên Tirkîyeyê de, ku tê heye ev yek tesîreke erênî û girîng bike li geşepêdana kurdîyê li Tirkîyeyê*” (Öpengin, 2011, r. 70).

Li Tirkîye, Sûrîye û Ermenîstanê alfabeya latînî; li Îran û Iraqê alfabeya kurdî-erebî tê bikaranîn, yanî di bikaranîna alfabeyê da yekîti tune ye. Zazakî û goranî ji alîyê hin lêkolîneran ve wekî dîyalektên kurdî nayên qebûl kirin. Zazakî dîyalekteke giring a kurdên li Tirkîyeyê ye û axêverên zazakî xwe wekî kurd dibînin. Öpengin li ser vê mijarê neketîye nav nîqaşên ziman û gotîye ku; “*Di vê xebata li ser sosyolojiya zimanî de em dê xwe bispêrine bingeh û motîvasyonên civakî ne yên zimanî.*” Ji bo rewşa Tirkîyeyê wekî dîyalekt behsa zazakî hatibe kirin jî di xebata qadê da zazakî cih negirtîye. Di vî warî da kesên li herêmên kurdnişîn wekî kurmanc û zaza ji hev nehatine qetandin. Di vê rewşê da standardîzasyona ziman jî gelek mijareke aloz e û ji nîqaşan ra vekirîye (Öpengin, 2011, r. 74-79). Piştî Şerê Cihanê yê Yekem, ji ber ku welatê kurdan parçe bûye û mafên ziman bi dest nexistine, rewşenbîrên kurd mecbûr mane li ser problemên kodkirina dengên zimanê xwe bişuxilin û bi alfabeyên wan welatên ku tê da dijîn mijûl bibin. Pirbûn û belavbûna weşanan di destpêka sedsala XXem da bal kişandine ser problema nivîsandina ziman û ew derxistine pêş (Akın, 2013, r. 22). Digel vê di 1960î û bi şûn da li ser alfabeya yekgirtî nîqaş hatine kirin. Kurdên Iraq û dîasporayê jî li ser vê mijarê sekinîne û nîqaşên li ser alfabeya yekgirtî xistine rojevê (Sheyholislami, 2015, r. 37).

Tradîsyona edebîyata kurdî digihê sedsalên XV-XVIem ku li qesrên mîrektîyan dest pê kirîye. Nesleke şairên ku di konteksta ziman da berhemên xwe bi kurdî dinivîsin derketine holê (Elî Herîrî, Melayê Cizîrî û hwd.). Ehmedê Xanî di Mem û Zînê da bal kişandîye ser qedrê zimanê kurdî. Dîsa tê dîtîn ku kurdî li bal erebî di medreseyan da zimanê perwerdeyê bûye. Bi damezrandina Komara Tirkîyeyê kurdî di her qadên jîyanê da hatîye qedexekirin. Piştî 1991ê qedexeyên li ser ziman hatine sistkirin (Öpengin, 2011, r. 78). Dîroka neteweyan wekî hefizaya neteweyan tê dîtîn ku bi saya van agahîyan rewşa kurdî ya li Tirkîyeyê hatîye diyarkirin. Ji bo geşedana ziman faktorên giring bi van agahîyan derketine berçav. Ji ber ku demeke dirêj kurdî bi destê amraz û dezgehên dewletê, bi rêya înkare hatîye bêqîmetkirin, veguheştina ziman jî kêr bûye. Veguheştin di bin tesîra zimanê tirkî da maye. Ev yek li ser bikaranîn û mantiqa ziman jî tesîr dike ku îfadeyên kurdî bi rêya wergerên deynkirî tên dayîn. Ji bilî vê li Tirkîyeyê deverên bajarî bûne kontekstên belavkirina zimanê tirkî ku ev yek li ser kurdî tesîreke neyînî pêk tîne (Öpengin, 2011, r. 89-95).

Li herêmên kurdan partîya siyasî ya kurdperwer desthilata mehelî bi dest xistîye. Di sala 2009an da hejmara şaredarîyên di destê partîya kurdperwer gihiştîye 99an. Öpengin vê yekê bi terma Edwards a “*rewşeke taybet (special status)*” rave kirîye. Dîsa di pêvajoya Yekîtiya Ewropayê da li Tirkîyeyê, “*mafê fêrkarîya taybet a zimanên herêmi*” di 2003yan da hatîye qebûl kirin. Li pey vê qanûnê kursên kurdî hatine vekirin. Di 2009an

da zanîngehên Sabancı û Bilgiyê li Stenbolê dest bi dersên kurdî kirine (Kurt, 2020, r. 89-90). Lê dema ku bidin berhev li gorî herêmên din ên li Tirkîyeyê rewşa perwerdeyê li herêmên kurdan kêr e. Bi saya sazîyên kurdî yên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê û TZP Kurdîyê ji bo fêrkarîya kurdî gelek xebat hatine kirin (Öpengin, 2011, r. 102-105).

Rojname û kovarên kurdî ji ber qedexeyan negihîştine armanca xwe. Öpengin ev rewş wiha anîye ziman: “*Nebûna perwerdeya bi kurdî û rêjeya nizm a xwendewariya bi kurdî û herwiha nebûna elaqeyê berketî, ji bilî elaqeya ji ber endîşeyên nasnameyî, rêyê li pêşketina çapemeniya kurdî teng dikin.*” Ji alîyê din ve medyaya kurdî li ser înternetê meydanê çalak e ku kurd înternetê pir bi kar tînin (Öpengin, 2011, r. 112-114). Li ser bikaranîna medyayê xebatên dîasporayê cihêkî giring digirin ku dîaspora ji bo xebatên kurdî bûye navenda çand û hunerê. Weşanên ewil ên vedor, stasyona TVyê, sîteya webê û bloga kurdî ya ewil li dîasporayê pêk hatine (Sheyhollislami, 2015, r. 46).

5. METODOLOJÎ Û DANE-BERHEVKIRIN

Ji bo lêkolîneke sosyolenguîstîk a civaka kurd a li Tirkîyeyê pêdivî bi nimûneyên heterojen hene. Li Dîyarbekirê ji alîyê civakî-dîrokî û siyasî ve li gorî herêmên rojhilatê jiyana bajarî li pêş e, lê mesela li Hekarîyê bajarîbûn ewqas ne di asteke bilind da ye û temaseke mekanî ya ewqas xurt jî di navbera duzimanan da nayê dîtin. Ji bo pirsîyarname cudahî û guherînên ziman diyar bike ji kontekstên gundewar, nîv-bajarî û bajarî pêk hatîye. Di konteksta gundewar da sê gundên Şemzînan Hekarîyê hatine hilbijartin ku nêzîkî sînore Îran û Iraqê ne. Ev sê gundên lêkolînê li gorî mesafeya wan a digel navenda bajarî hatine hilbijartin. Qezaya Şemzînan wekî konteksta nîv-bajarî hatîye destnîşankirin ku li ser sînoren Tirkîyeyê yên Îran û Iraqê ye. Di bîst-sih salên dawî da ji gundan koç girtîye ku wan kesan têkilîya xwe ji gundên xwe nebirîne. Lewma Şemzînan di konteksta nîv-bajarî da ji bo vê xebatê hatîye girtin. Ji bo berhevkirina daneyan di konteksteke bajarî da Dîyarbekir hatîye hilbijartin ku bajarê herî mezin e herêmê ye (Öpengin, 2011, r. 115-118). Berîya analîza daneyan pêwîstî bi ravekirina daneyên pirsîyarnameyê hatîye dîtin û daneyên pirsîyarnameyê yên qada xebatê hatine teswîrkirin. Bi vî awayî çarçoveya lêkolînê derketîye holê. Ev beş ji kurte-destpêkek û pênc sernavan pêk tê ku tevî bin-sernavan ev yek dibe neh sernav (Öpengin, 2011, r. 115-123).

Her çiqas lêkolîn li ser rewşa sosyolenguîstîk a kurdî ya li Tirkîyeyê be jî ji ber ku kurd ji % 40 li derveyê herêma kurdan dijîn ev xebat tevahîya kurdên li Tirkîyeyê nagire nav xwe. Öpengin di vî warî da dibêje ku pêdivî bi lêkolîneke li ser rewşa kurdî ya li bajarên mezin ên rojavayî heye. Ew diyar dike ku xebata wî bi vekolîna rewşa

ziman a li herêma kurdî bisînor e. Öpengin bi vî awayî sînoren xebata xwe zelal kirîye û xwestîye bide zanîn ku xebata wî tevahîya kurdên li Tirkîyeyê temsîl nake. Her konteksta koma vekolînê ji şeş malbatan pêk hatîye. Di konteksta gundewar da ji her gundekî du malbat hatine hilbijartin ku li gorî şert û mercên jîyanê ji hev cuda ne. Di wê kontekstê da bi tevahî bi 27 axêveran ra pirsîyarname hatine dagirtin. Di konteksta nîv-bajarî da jî malbatên xwedîyê rewşên sosyo-ekonomîk ên cuda hatine hilbijartin. Ji kontekstta nîv-bajarî bi 25 axêveran ra pirsîyarname hatîye dagirtin. Di kontekstta bajarî da li Dîyarbekirê malbatên ku tevli lêkolînê bûne ji 24 axêveran pêk tên (Öpengin, 2011, r. 119-120).

Pirsîyarnameyê li ser hîpotezên lêkolînê hewl daye ku giraniya zimanê kurdî û tirkî diyar bike. Pirsîyarnameyê ji 79 pirsên di 8 beşan da sinifandî pêk hatîye. Ji ber ku li Tirkîyeyê tirkî zimanê perwerde û nivîsê ye di xebatê da tenê pirsîyarnameyên nivîskî yên bi tirkî hatine bikaranîn. Lê agahîderên tevli lêkolînê bûne bi gelemperî bersivên xwe bi kurdî dane. Tenê 21 agahîderê lêkolînê bersivên xwe bi tirkî dane. Daneyên vekolînê bi bernameya Microsoft Office Excel 2007an hatîye tehlîl kirin (Öpengin, 2011, r. 120-123). Öpengin di vê beşê da ji beşdaran bigirin heta amadekiriya pirsîyarnameyê û rêbaza tehlîla daneyan bi giştî rave kirîye û di pêvajoya analîza daneyan da amadekarîyên xwe gav bi gav li ber çavan raxistîye.

6. ANALÎZA DANÉYAN

Pirsîyarnameya lêkolînê bi 76 kesan ra hatîye dagirtin ku jê 36 jin û 40 jî mên in. Pirsîyarname bi şiklekî hevdiîtina nîv-diyarkirî (semi-directional) hatîye sepandin. Ev beş ji kurte-destpêkek û heşt sernavên sereke pêk hatîye, tevî bin-sernavan hejmara sernavan bûye sih û yek. 24 grafîkên frekansê û 16 tabloyên nirxandina daneyan di analîzê da cih girtine (Öpengin, 2011, r. 125-173). Li gorî vê lêkolînê kesên salmezîna ên ji çil salî mezintir ji ciwanan zêdetir bi kurdî diaxivin. Di nav van kesan da rêjeya xwendevanîyê gelek kêma e. Ji bilî vê ji ber ku koçberî bi xwe ra guherîn û adaptasyona ziman jî tîne xala koçberî ji bo lêkolînê giring hatîye diîtin. Rêjeya koçberîyê di konteksta bajarî da wekî %80, di konteksta nîv-bajarî da wekî %40 hatîye tespît kirin. Di nav kesên koçkirî da yên ji bîst salî biçûktir hindik bûne. Ev yek diyar dike ku malbatên koçkirî berî salên 1990an li cihwarên xwe yên nû bi cih bûne (Öpengin, 2011, r. 127-128). Li gorî rewşa sosyo-ekonomîk dahatên herî kêma di konteksta gundîyê da hatîye diîtin. Dîsa di konteksta gundîyê da nexwendewarî û astên nizm ên perwerdeyê serdest in. Piraîniya agahîderên konteksta nîv-bajarî gihiştine asteke bilind. Rêjeyêke zêdeya nexwendewarîyê di konteksta bajarî da hatîye diîtin ku sedemê vê yekê wekî koçberî derdikeve pêşberî me. Lewra piraîniya konteks-

ta bajarî ji koçberan pêk tê (Öpengin, 2011, r. 131-133).

Ji alîyê duzimanîyê ve nexwendewarîya bi kurdî bi taybetî di konteksta gundîfîyê da hatîye dîtin ku nexwendewarîya tirkî jî di vê kontekstê da zêde ye. Balkêş e ku nexwendewarîya bi kurdî û tirkî li gorî konteksta bajarî li nîv-bajarîyê kêmîtir e ku sedemê vê yekê rewşa koçê ye. Piranîya axêveran, zimanê zikmakî bi nasnameyê ra têkildar kirine. Di nav agahîderan tenê keçeke di konteksta bajarî da kurdî wekî zimanê zikmakî nedîfîye. Digel kurdî herî zêde tirkî di axaftinên derveyî malê da hatîye bikaranîn. Ji çavdêrîyê hatîye derxistin ku kurdî êdî serdestîya xwe ya di danûstandinên nav axêverên xwe da ji dest daye. Lê kurdî hê jî heta dereceyekê serdestîya xwe diparêze. Wekî zimanê bilind tirkî bi piranî di qadên fermî da tê bikaranîn ku kurdî wekî zimanê nizm zêdetir di qadên nefermî da di jiyana rojane da tê bikaranîn. Öpengin vê rewşê li gorî teorîya Fishman rave kirîye ku bikaranîna zimanan bi awayekî qetî jî hev cuda nîne, heta dereceyekê ziman ketine nav qadên hev (Öpengin, 2011, r. 135-145).

Kurdên li Tirkîyeyê heta sala 1996an tenê xwedîyê îmkana temaşekirina televîzyonên bi tirkî bûne. Yekemîn kanala kurdî ya Med-TV di sala 1995an li Londonê dest bi weşanê kirîye. Piştî kanalên din ên peykî jî dest bi weşanên xwe kirine (Öpengin, 2011, r. 113). Di sala 1999an da bi pêvajoya berendamîya Tirkîyeyê ya Yekîtiya Ewropayê di qada mafên ziman da gelek pêşketin çêbûye. Di sala 2002yan da bi qanûnekê rê li ber weşanên televîzyonên kurdî vebûye û gelek qedexeyên li ser ziman û çanda kurdî hatîye rakirin. Radyo û televîzyonên kurdî dest bi weşanê kirine. (Filiz, 2015, r. 104) Di 2009an da yekem kanala giştî ya kurdî TRT6 hatîye damezrandin. Piranîya axêveran di derbarê vekirina kanalê da xwedîyê fikrên negatîf bûne ku di vir da li ser hîlbijartina kanalên meyla îdeolojîk tê dîtin. Lê hinek axêver jî vê rewşê jî bo bikaranîna kurdî wekî gaveke giring dîtine. Ji lêkolînê tê derxistin ku kurdî jî bo piranîya axêverên xwe wekî zimanekî zarekî maye (Öpengin, 2011, r. 147-155). Qîyasa şîyanwerîyên di du zimanan da nîşan daye ku ji agahîderan %30 asta zanîna xwe ya kurdî jî ya tirkî baştir dîtine. Berevajîyê vê jî %10 jî zanîna xwe ya tirkî jî kurdî baştir dîtine. Ji alîyê din ve ji agahîderan %36 şarezatîya xwe ya tirkî jî kurdî çêtir dîtine ku ji %47 jî kurdîya xwe jî tirkî çêtir dîtine (Öpengin, 2011, r. 158).

Ji bo giringiya têkilîya di navbera varyablan bê nîrxandin ji testa “khideux/xidu” hatîye îstifadekirin. Encamên lêkdana testê daye xuyakirin ku ji bo şîyanwerîyên kurdî konteksta gundî xwedîyê pileya herî bilind e. Di konteksta bajarî da şîyanwerî nizmîtir bûye. Şîyanwerîyên herî nizm di konteksta bajarî da hatîye dîtin. Di heman demê da ji bersivan hatîye fahmkirin ku jin di ragihandinê da li gorî mêran zêdetir xwe bi kurdî îfade dikin. Dîsa ji encamên testan derketîye ku meyla agahîderên ji

bîst salî biçûktir li ser tirkî ye. Öpengin ew rewş wiha îfade kirîye: “*Di nava zarok û nûciwanan da, tirkî, serdestîya xwe her bêtir peyt û berfireh dike gava axaftin û danûstandin taqên xanî dibezînin*” (Öpengin, 2011, r. 160-168). Suzanne Romaine, ew rewş bi qedexeyên li ser ziman ra têkildar kirîye û gotîye ku: “*Di hin rewşan da axaftina zimanekî bi giştî tê qedexekirin. Mînak: Kurdên li Tirkîyeyê. Di civakekê da ziman di bin tehdîdê da be ji aliyê zarokan ve hînbûna wî zimanê zehmet e*” (Romaine, 2000, r. 54). Di lêkolînê da berê di derheqê bikaranîna ziman û frazên rojane yên axêveran da agahî hatine bidestxistin û paşê tehlîla şîyanwerîyên ziman hatiye kirin. Şîyanwerîyên ziman di kurdî da bi neslê axêveran, derdor, konteksta sosyolîzasyonê û bi asta xwendinê ra eleqedar in (Öpengin, 2011, r. 166-172).

Öpengin bi sernavê “*Encamên Lêkolînê û Çend Perspektîf bo Paşerojê*” di derheqê lêkolînê da xwîneran agahdar kirîye û li ser zehmetiyên lêkolînê sekinîye. Li gorî tespîtên lêkolînê; kurdî li gorî zimanên din di statuya zimanê nizm da ye. Kurdî êdî ne zimanê danûstandinê ye, zimanê mal û malbatê ye. Ji aliyê sosyo-polîtîk ve bicihbûna wan a jeografîk jîndariya etno-zimanîya cemaetê xurt dike. Salên dawî di warê medyayê da temsîla kurdî zêde bûye. Agahîder bi gelemperî zimanê xwe wekî nasnameya xwe îfade kirine. Ji ber ku kurdî ne zimanê nivîs û perwerdeyê ye ji bo piraniya axêveran wekî zimanê zarekî maye. Ji bilî vê duzimanî herî zêde di konteksta nîv-bajarî da berbelav bûye. Di vê kontekstê da rêjeya şîyanwerîyên ziman û xwendewarîya bi kurdî herî nizm e. Ji aliyê şîyanwerîyê ve konteksta bajarî bilind e, çimkî li bajêr gelek koçber niştecîh bûne. Rewşa kurdî ya li Tirkîyeyê wekî mînakeke duzimanîtiya bêyî diglosî ye (Öpengin, 2011, r. 175-181).

7. ENCAM Û NIRXANDIN

Di warê sosyolenguîstîkê da xebatên nû bînin kirin jî ji bo rewşa kurdî ya sosyolenguîstîk a li Tirkîyeyê xebateke bi vî rengî ya sereke hêjayî xwendin û nirxandinê ye ku ji bo xebatên piştî xwe bûye mînakeke baş. Di vê xebatê da frazên ziman ên axêverên kurd ên li herêma kurdî ya Tirkîyeyê hatîye vekolîn û encamên xebatê hatine pêşkêşkirin. Rewşa kurdên li Tirkîyeyê ji aliyê demografîk, civaknasî, dîrokî, siyasî û hwd. ve hatîye dayîn. Li ser bikaranîna ziman tesîra hêmanên temen, prestîja ziman, zayend û asta perwerdeyê hatîye tespîtkirin. Lêkolîn li ser sê kontekstên cuda (gundewarî, nîv-bajarî, bajarî) yên herêmên kurdan pêk hatîye û agahiyên bi rêya pirsîyarnamêyê hatine bidestxistin di beşa dawî ya “*Analîza Daneyan*” da hatîye nirxandin. Lê ji ber ku lêkolîna qadê tenê li Dîyarbekir, Şemzînan û sê gundên Şemzînan hatîye kirin temsîliyeta wê ya tevahîya herêma kurdî ne xurt e ku di xebatê da jî ev yek hatîye destnîşankirin. Ji aliyê vekolandina mijarê û arman-

ca lêkolînê ve rê û rêbazên hatine diyarkirin bi awayekî serkeftî hatine meşandin. Paşxaneya xebatê baş hatîye amadekirin û beş bi hev ve hatine têkildarkirin. Ji alîyê bikaranîna ziman ve ji zimanê standart zêdetir zimanekî herêmî hatîye tercîhkirin. Ji alîyê çavkanîyan ve biblîyografyayêke dewlemend li ber çav e, gelek xebatên sereke yê literatûrê di vê lêkolînê da cih girtine. Lêkolîn bi giştî gihîştîye armanca xwe, daneyên hatine bidestxistin bi îfadeyên di cih da hatine ravekirin, bi grafîk û tabloyan rêjeya bikaranîna ziman li ber çavên xwîneran hatîye raxistin.

8. ÇAVKANÎ

Adak, A. (2014). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Stenbol: Nûbihar.

Akın, S.(2013). *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*, Stenbol: Avesta.

Baker, C. (1993). “*Bilingualism: Definitions and Distinctions*” *Foundations of bilingual education and bilingualism*, Nancy H. Hornberger (eds.). Clevedon: Multilingual Matters, 2-16.

Filiz, M.Ş. (2016). “*Weke Zimanekî Kêmar Serpêhatîya Statuya Zimanê Kurdî*” Nûbihar, j.4, s.2, 91-111.

Hickey, R. (2007). “*Language and Society*” [https://www.unidue.de/ELE/ Language AndSociety.pdf](https://www.unidue.de/ELE/LanguageAndSociety.pdf). (16.11.2022).

Kurt, Ş. (2020). *Türkiye’de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi 1968-2018*, Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Diyarbekır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü ABD.

Sheyholislami, J. (2015). “*The language varieties of the Kurds*” in *The Kurds*, by Wolfgang Taucher, Mathias Vogl, Peter Webinger (eds.). Austrian Federal Ministry of the Interior, Vienna, 30-51.

Romaine, S. (2000). “*Language Choice*” *Language in Society: An Introduction to Sociolinguistics*. (2nd ed). Oxford, New York, 32-63.

Öpengin, E.(2011). *Rewşa kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkîyeyê*, Stenbol: Avesta.